Çapa Kurdî

Rênîşandan

BANGA SERLÊDANÊ ji bo Şirketên ku Navenda Wan li Sûriyê ye

Ji bo Hevkarîyên Geşepêdana Sektora Taybet bi Armanca Xurtkirina Behreyan

û Karmendîyê li Sûriyê

Koma Armancgirtî: Şirketên ku li Sûriyê hatine damezrandin û li wir çalak in

Welatê Bicihanînê: Sûriye

Dîroka Dawî ya Serlêdanê: [23 Kanûna Pêşîn 2026]

E-posta Serlêdan: syria-private-sector@giz.de

Mijara Emailê ji bo Serlêdanê: Banga ji bo Serlêdanê – Şirket li Sûriyê Pejirandî ye – [Navê Şirketê]

Table of Contents

Beşa 1: Pêşgotin 4

Beşa 2: Paşxane 4

Beşa 3: Rênimayên Serlêdanê 5

Armanca Bangê 5

Kî kare Serlêdanê Bike? 6

Mercên Guncanîya Projeyê 7

Mawe û Qebareya Projeyê 8

Kîjan Çalakiyên Projeyê di Çarçoveya Bangê de Tên PiştgirîKirin? 8

Bang bi taybetî pêşwaziyê li çalakiyên ku van xalên jêrîn pêş dixin dike: 9

Di Çarçoveya Projeyên Hevkarî û Geşepêdana Sektora Taybet de, Kîjan Mesref ji bo Vegerandinê Guncaw in? 10

Beşa 4: Bang û Pêvajoya Serlêdanê 11

Nerîneke Giştî li Pêvajoya Serlêdan û Hilbijartinê 12

Destpêkirina Bangê û Pêşkêşkirina Pêşniyaran 12

Kontrolkirina Guncaniyê 13

Nirxandina Pêşniyarên Projeyan 14

Amadekirina Lîsteya Kurt û Pêşxistina Pêşniyara Tam a Projeyê 14

Pêşkêşkirin û Nirxandina Pêşniyarên Projeyên Tam 15

Hilbijartina Dawî û Pejirandin 16

Hûrbînîya Pêwîst û Kontrolên Îdarî, Qanûnî û Pabendîyê 16

Imzekirina Girêbestê 17

Belgeyên Pêwîst 17

Parastina Daneyan 18

Têkilî 19

Lîsteya Kurteya Navan

Kurte	Nav bi temamî
BMZ	Wezareta Federal a Almanyayê ya bo Hevkariya Aborî û Geşepêdanê *(German Federal Ministry for Economic Cooperation and Development)*
CET	Dema Ewropaya Navendî *(Central European Time)*
DPP	Hevkariya Geşepêdanê ligel Sektora Taybet *(Development Partnership with the Private Sector)*
EU	Yekîtiya Ewropayê *(European Union)*
FTE	Berdêla Xebata Dema Tam *(Full-time equivalent)*
GIZ	Ajansa Almanî ya bo Hevkariya Navneteweyî (GIZ) GmbH *(Deutsche Gesellschaft für Internationale Zusammenarbeit (GIZ) GmbH)*
SDC	Ajansa Swîsrî ya bo Geşedan û Hevkariyê *(Swiss Agency for Development and Cooperation)*
STEP	Perwerde û Rahênana Teknîkî û Pîşeyî û Pêşxistina Karmendiyê li Sûriyê *(Technical and Vocational Education and Training (TVET) and Employment Promotion in Syria)*
TVET	Perwerde û Rahênana Teknîkî û Pîşeyî *(Technical and Vocational Education and Training)*

Beşa 1: Pêşgotin

Bernameya Perwerde û Rahênana Teknîkî û Pîşeyî (TVET) û Pêşxistina Karmendîyê li Sûriyê (STEP) destpêşxeriyeke çarsalî ye ku ji sala 2026an heta 2030î berdewam dike. Ev bername ji aliyê Ajansa Almanî ya bo Hevkariya Navneteweyî (GIZ) ve, li ser navê Wezareta Federal a Almanyayê ya bo Hevkariya Aborî û Geşepêdanê (BMZ), Yekîtiya Ewropayê (EU) û Ajansa Swîsrî ya bo Geşepêdan û Hevkariyê (SDC) tê cîbicîkirin.

Programa STEP bi rêya pêşvebirina karmendiyê, pêşxistina hêza kar û handana li ser hevkarîyeke xurtir di navbera sektora taybet û saziyên giştî yên perwerde û rahênana teknîkî de, piştgiriyê dide geşepêdana aborî li Sûriyê.

Wekî beşek ji karê xwe yê pêşvebirina karmendîyê. Bername pencerereyeke serlêdanê ya taybet ji bo şirketên sektora taybet ku navenda wan li Sûriyê ye vedike.

Ev pencere Bangê dide şirketên ku li Sûriyê hatine damezrandin û li wê derê çalak in, da destpêşxariyên ku hewcedarîyên berçav yên bazirganî û bazara kar dabîn dikin, û di heman demê de sûdeyên geşepêdanê yên tên pîvan bi dest bixin, pêşniyar bikin.

Tê pêşbînkirin ku hevbeşiyên pêşniyarkirî berjewendiyên bazirganî yên şirketên beşdar ligel armancên geşepêdanê bigihînin hev, di nav de afirandina derfetên kar, pêşxistina hêza kar, veguhastina pisporî û afrendyarîyan û baştirkirina hevrikiya pîşeyî ya şirketên Sûriyê.

Girîngiyeke taybet tê dayîn bi destpêşxariyên ku hevkarîyeke armancdar û domdar di navbera şirketên Ewropî û Sûrî û/an alîyên dabînkerên perwerde û rahênana teknîkî ya giştî de, peyda dikin.

Ev bang hewl dide ku wan şirketên taybet destnîşan bike, ên bi armanca qazancê li Sûriyê hatine damezrandin û li wê derê çalak in, giringîyê didin pêşxistin û bicîanîna destpêşxariyên nûjen ji bo bercewendîya bazarê, ligel pêşvebirina behreyan û/an dabînkirina derfetên kar bi awayekî pîvandar û bi sûdeyeke giştî ya dîyar a têkeve xizmeta geşepêdanê de.

Ev pencere armanc dike ku derfetan ji bo şirketên Sûrî çêbike, da bigihîjin pisporiya teknîkî, teknolojî, şiyana perwerdehiyê, zanîna teknîkî û hevbeşiyên navneteweyî di heman demê de sûdên pîvandar bighîne karmendan û aboriya giştî ya Sûriyê.

Beşa 2: Paşxane

Başbûna rewşa aborî ya Sûriyê hewcedarî girêdaneke xurt e di navbera hewcedarîyên sektora taybet, veberhênan û pêşvebirina behreyan de. Gelek caran pêdiviya şirketan bi karkerên şareza, pisporiya teknîkî û teknolojiyên nû heye, di heman demê de dezgehên perwerdeyî û rahênana teknîkî û saziyên din yên bazara kar, hewcedarî têkilîyên xurtir in li gor pêdivîyên guhêrbar ên bazarê.

Bername balê dikişîne ser girîngiya peywendiyên xurtir di navbera pêdivîyên bazara kar û pêşvebirina behreyan de. Hevkarîya di navbera şirket, dabînkerên perwerde û rahênana teknîkî û alîyên din ên çalak de, alîkariyê dike ku piştrast bibe ku perwerde bi awayekî bibandortir bersivê dide pêdiviyên xwediyên kar û beşdarî baştirkirina derfetên karkirinê dibe.

Ji ber vê yekê Ajansa Almanî ya Hevkarîya Navdewletî GIZ Sûrîye, dixwaze bi şirketên xwedan ezmûn re hevkarîyê bike , ji ber ku ev şirket dikarin pisporiya bazirganî, teknîkî, teknolojî û perwerdeyê peyda bikin. Bi vê hevkarîya geşepêdanê, şirket pêdiviyên xwe yên bazirganî dabîn dikin, di heman demê de, derfetên kar ên nû diafirînin, pisporîya karmendan jî pêş dixin û saziyên Sûrî xurt dikin.

“Pencereya Sûriyê” hatiye sazkirin da ku piştgiriyê bide şirketên Sûrî, ji bo dabînkirina pêdiviyin destnîşankirî yên karsazîyê û bazara kar, di heman demê de geşepêdaneke ku were pîvan çêkin. Û armanca şirketên piştgirî bo wan hatîye dan ew be, ku beşdarî pêşxistina dabînkirina kar bi awayekî domdar, pêşxistina hêza kar, veguhastina behreyan, afrendyarî, hilberîn û şiyana hevrikiya şirketên Sûrî, bibin.

Pencere bi taybetî giringîyê de destpêşxariyên ku şiyana şirketên Sûrî xurt dikin ji bo çêkirina derfetên kar ên domdar û pêşxistina behreyên wan ên kar, anîn an baştirkirina teknolojî û pêvajoyên hilberînê, û çêkirina peywendiyên xurtir di navbera şirketan û dabînkerên perwerdeya teknîkî de.

Dibe ku hevbeşî hevkariyê bi van alîyan re bike: Şirketên din ên Sûrî, şirketên Ewropî û navneteweyî, dibistanên gîştî yên rahênanê an navendên perwerdeyê, peymangehên teknîkî, zanîngeh, dabînkerên taybet yên perwerdeyê, xizmetên karmendîyê, komeleyên bazirganî û saziyên din yên herêmî an navneteweyî yên têkildar.

Bi rêya van hevbeşiyan, STEP armanc dike ku çareseriyên pratîkî yên arasteyî bazarê hêsan bike; çareserîyên ku bersivê didin pêdiviyên şirket û karkerên Sûrî, û beşdarîyê di pêşveçûna domdar û xweragirîya aboriya Sûriyê de dikin.

Beşa 3: Rênimayên Serlêdanê

Armanca Bangê

Armanca Bangê destnîşankirina şirketên ku navenda wan li Sûriyê ye û amade ne û dikarin bi hev re rêkarên afrênerî yên arasteyî bazarê li Sûriyê (li parêzgehên ku li jêr hatine hilbijartin) bi cih bînin, yên ku di encamê de:

- derfetên nû yên kar çêdikin;
- perwerde û rahênana teknîkî ya di bercewendiya bazarê de xurt dikin;

- karkerên herêmî yên jêhatî li gorî pêdiviyên şirketên sektora taybet û bazara kar a berfirehtir pêş dixînin;
- piştgiriyê didin veberhênana bazirganî ya domdar a ku derfetên karmendîyê yên zêdetir peyda dike;
- veguhastina teknolojî, zanyarî û afrênerîyê pêş dixîne;
- jîngeha kar çêtir dikin, bi taybetî ji bo beşên lazwaz ên civakê;
- hevkarîya di navbera şirketan û dabînkerên perwerde û rahênana teknîkî de xurt dikin;
- beşdarî xweragirîya aborî ya Sûriyê û geşepêdana wê ya domdar dibin.

Divê destpêşxeriya pêşniyarkirî li ser bingeha hewcedariyeke bazirganî ya destnîşankirî be, û bandoreke wê ya geşepêdanê ya pêbawer a were pîvan hebe.

Pêdivî ye ku serlêder sedemên bazirganî yên çalakiyên pêşniyarkirî, bandorên wan ên çaverêkirî li ser derfetên kar û/an pêşxistina pisporîyan, rêkarên cîbicîkirinê yên pêşniyarkirî û domdariya encaman eşkere bikin. Her weha divê sûdeya prohe ya giştî ya ku divê bi awayekî berbiçav ji berjewendiyên bazirganî berfirehtir be, hebe.

Kî kare Serlêdanê Bike?

Ev Bang ji bo şirketên sektora taybet, ên armanca wan qezenc e û bi awayekî qanûnî hatine damezrandin û li Sûriyê çalak in vekirî ye.

Ji bo ku mafê serlêder ê serlêdanê hebe, divê hemû mercên herî kêm ên jêrîn bi cih bîne:

- şirket a sektora taybet be û ji bo qezencê bixebite;
- bi awayekî qanûnî hatibe damezrandin û li Sûriyê çalak be;
- bi awayekî qanûnî hatibe damezrandin û bi kêmanî salekê kar kiribe da ku lîsteyên xwe yên darayî yên herî dawî, an jî belgeyên darayî yên cihên wan digirin, ên bi awayekî serbixwe hatine piştrastkirin, pêşkêş bike;
- bi kêmanî **sê karmendên bi mûçeyên tamwextî (FTE) tevlî xebatê bike**;
- hebûna **şiyana darayî û diravên têrker nîşan bide, bi awayê ku karibe pişka şîrketê ya hevkarîyê peyda bike** û projeya pêşniyarkirî cibicî bike ;
- xwedan şiyanên teknîkî, rêveberî û çavkaniyên mirovî yên pêwîst be, da ku çalakiyên pêşniyarkirî bi cih bîne an bi awayekî kartêker çavdêriyê bike;
- sîstemeke wê ya avabûnê ya guncaw ji bo pabendîyê, rêvebirina metirsîyan û durustiyê hebe;
- pabendîyê bi qanûnên neteweyî û yên Yekîtiya Ewropayê (YE) û pêdivîyên rêxistinî yên têkildar bike;
- pabendiyê bi mafên mirovan, standerdên kar û pîvanên civakî yên li ser asta navdewletî pejirandî ne, bike;

- di dosya wê ya berê de tu arîşeyên derbarê xapandin, gendelî, reftarên xirab ên pîşeyî yên giran an binpêkirinên din ên têkildarî durustiyê tune bin, ku bibin sedem ku nikaribe serlêdanê ji bo vê Bangê bike;
- amade be û karibe bi GIZê re hevkarîyê bike, û di heman demê de hevkar be ligel şîrketên Sûrî, saziyên rahênana pîşeyî û perwerdekirinê, zanîngeh, peydakerên perwerdeyê, xizmetên karmendîyê, û heperên herêmî yên ji bilî wan jî; û
- şiyana xwe ya cîbicîkirinê an çavdêriya katêker li ser çalakiyên pêşniyarkirî li Sûriyê nîşan bide.

GIZ dikare di qonaxa kontrolkirina guncanîyê de, hûrbînîya pêwîst di dema nirxandina teknîkî an pêvajoya amadekirina projeyê de bike, û belge an zanyarîyên zêdetir bixwaze da ji pabendîyê û guncanîyê piştrast bibe .

Girîng e: Peydabûna mercên herî kêm ên guncaniya şirketa serlêder, nabe garantîya hilbijartina wê ji bo fînansekirinê. Serlêdanên guncaw dê têkevin bin nirxandina teknîkî, hûrbînîya pêwîst û rêkarên pejirandinê yên pesednkirî û asta hebûna şiyana darayî.

Mercên Guncanîya Projeyê

Ji bo ku projeya hatiye pêşniyarkirin ji bo piştgiriyê were pejirandin, divê astên herî kêm ji van mercên jêrîn bi cih bîne:

- li yek an çend ji parêzgehên Sûriyê yên jêrîn bê cîbicîkirin: Şam, Gundewarê Şamê, Hims, Laziqiye, Tertûs, Der'a, Heleb, Reqa.
- Bersiva hewcedariyeke zelal di warê karsazîyê û bazara kar de bide;
- beşdariyeke rasterast an nerasterast bike di warê dabînkirina derfetên kar, paydakirina dahatê, perwerdekirina ji bo karmendiyê, pêşxistina hêza kar, xurtkirina behreyan an kalîteya kar;
- ji aliyê aborî û teknîkî ve bikêrhatî be;
- armanc û encamên wê yên zelal ên geşepêdanê yên ku tên pîvan hebin;
- rêyeke cihê bawerîyê ber bi encamên domdar ve nîşan bide;
- qebareya zêdekirina fînansekirina hevbeş a giştî ya GIZê û sedemên wê nîşan bide, û zelal bike; gelo çima nepêkan e çalakiyên pêşniyarkirî bêyî zêdekirina piştgiriya giştî bicî bibin, an jî ew dê di asteke pir piçûktir de be, an dê bandora wan a geşepêdanê pir kêmtir be;
- beşdariya guncaw a şirketê li gorî pêdivîyên parvekirina mesrefan yên derbasdar hebe;
- pabendî qanûn û rêziknameyên pêwendîdar be;
- li gorî standardên jîngehî, civakî, karmendiyê û mafên mirovan ên GIZê yên têkildar be;
- rêkarên wê yên guncaw hebin ji bo naskirina rîskên cîbicîkirinê yên têkildar; çawa wan metirsîyan birêve bibe û xwe ji wan biparêze ; û

- karibe di nava heyama herî zêde 30 mehan de cîbicîkirinê bi dawî bike.

Projeyên ku têne plankirin divê bi awayekî bin, ku çalakî û encamên wan ên sereke piştî heyama piştgiriya GIZê jî domdar bin, mezin bibin an bêne dubarekirin.

Guncanîya projeyê ji mafdariya şirketa serlêder cuda ye. Dibe ku şirketa serlêder, hemû mercên herî kêm bi cih bîne, lê dîsa jî projeya wê ya pêşniyarkirî ne guncan bê dîtin, ji ber ku mercên mafdariya projeyê yên li jor hatine diyardikirin bi cih neanîne.

Mawe û Qebareya Projeyê

Heyama cîbicîkirinê ji bo hevkariyeke kerta taybet a piştgirîya wê hatiye kirin, di navbera 12-30 mehan de ye. Divê projeyên pêşniyarkirî bi awayekî bêne plankirin ku çalakî û encamên pêşniyarkirî karibin bi awayekî rasteqîn di vê çarçoveya demê de bêne bidestxistin.

GIZ dikare fînansekirina hevbeş a giştî heta %50 ji lêçûnên projeyê yên guncan peyda bike. Pişka GIZê dê bi kêmanî 40,000 EUR be. Divê şîrketa beşdar bi kêmanî %50 ji tevahiya lêçûnên projeyê yên pejirandî peyda bike. Pişka şîrketê dikare bi rêya beşdariyên darayî an jî ne darayî yên guncan were dabînkirin, eger rêzikên peywendîdar destûrê bidin;

di dema amadekirina hûrgulîyên projeyê û pêvajoya imzakirina girêbestê de, dê li ser şêwazê fînansekirinê yê dawî, budceya projeyê û kategoriyên mesrefan ên guncaw were lihevkirin.

Kîjan Çalakiyên Projeyê di Çarçoveya Bangê de Tên PiştgirîKirin?

Bang ji alîyê sektoran ve bêalî ye û hemû sektoran dihewîne. Pêdivî ye ku çalakiyên pêşniyarkirî beşdariyeke zelal di dabînkirina derfetên kar, paydakirina dahatê, zêdekirina şiyanên xebitînê, geşepêdana hêza kar û kalîteya wî an pêşxistina jêhatîbûnê, nîşan bide.

Heye ku çalakiyên têne piştgirîkirin van xebatan li xwe bigirin:

- veberhênanên ku derfetên kar ên zêdetir peyda dikin;
- rêkarên karmendîyê û hiştina kadroyên kar yên berê;
- perwerdeya pîşeyî di hundirê şirketan de;
- bernameyên bilindkirina asta pisporîyê û perwerdeya pîşeyî;
- perwerdeya rêkûpêk di dema kar de;
- perwerdeya li gor cihê kar;
- plansaziyên şagirdiya pîşesazî, rahênanên pratîkî û korsên perwerdeyê yên guncandinê;
- perwerdekirina karkerên heyî û yên ku heye tevlî kar bibin;
- perwerdeya çavdêrî û rêvebirinê ji bo baştirkirina kalîteya karan;
- pêşxistina behreyên pîşeyî û teknîkî û;
- destpêşxeriyên perwerdekirina perwerdekaran .

Dibe ku hevbeşî hevkariya bi van alîyan re li xwe bigire:

- dibistanên amadehî yên pîşeyî;
- navendên perwerdeya pîşeyî;
- peymengehên teknîkî;
- zanîngeh;
- peydakerên perwerdeyê ji sektora taybet ;
- peydakerên xizmetên karmendîyê;
- odeyên bazirganî û komeleyên karsaziyê;
- rêxistinên xwecihî; û
- alîyên din ên têkildarî bazara kar.

Çalakiyên texmînkirî van mijaran li xwe digirin: Geşedan an guncandina rêbaz û programên li gor hewcedarîyê, derfetên perwerdeya pratîkî, fêrbûna li gor cihê kar, amadekirina dosyayên pîşeyî û standardên perwerdeyê ligel perwerdekirin û nîşandana rê ji bo rahênankkar û çavdêran li cihê kar.

Bang bi taybetî pêşwaziyê li çalakiyên ku van xalên jêrîn pêş dixin dike:

- karmend û jîngehên kar ên cihêreng û berfireh;
- beşdarkirina beşên civakî yên herî lawaz wek kesên astengdar;
- bihêzkirina jinan di warê aborî de;
- awayên hevgirtina civakî li cihê kar;
- veguhastina teknolojîyê û pisporîya teknîkî;
- bikaranîna pêvajoyên hilberîn an xizmetguzariyê yên kesk û dîjîtal;
- dîjîtalîzekirina pêvajoyên karsazî û perwerdeyê;
- pêşxistina berhem an xizmetguzariyên afirandî;
- hevkariya di navbera şirketên Ewropî û Sûrî de;
- hevkariya teknîkî ya demdirêj; û
- mekanîzmayên veguhastina zanînê yên domdar.

Cîbicîkirina li Sûriyê: Pêdivî ye ku projeyên hatine piştgirîkirin li Sûriyê bên cîbicîkirin (li yek an çend parêzgehên Sûriyê yên ku li jor hatine destnîşankirin)

Şirketên serlêder ên Ewropî tên handan li ser ku karê xwe li gel hevkarên herêmî yên guncav destnîşan bikin û bi wan re bixebitin, di nav de şirketên Sûrî, dibistanên pîşesazî, navendên perwerdeyê, zanîngeh û peymangehên teknîkî, peydakerên perwerdeyê ji sektorên taybet , komeleyên pîşesaziyê, xizmetên karmendiyê, rêxistinên karsaziyê û saziyên din ên herêmî yên pêwendîdar.

Di dema ku hevkarî pêk were, pêdivî ye ku pêşniyar bi zelalî rave bike dê çawa berpirsiyarî, çavkanî, zanyarî û pisporî di navbera şirketên serlêder ên Ewropî û hevkarên cîbicîkirinê yên herêmî de bêne parvekirin.

Di Çarçoveya Projeyên Hevkarî û Geşepêdana Sektora Taybet de, Kîjan Mesref ji bo Vegerandinê Guncaw in?

Hevparî dê li ser bingeha parvekirina mesrefan bêne cîbicîkirin.

Dibe ku GIZ fînansekirina giştî ya hevpar heta %50 ji mesrefên projeyê yên guncan peyda bike. Tê pêşbînkirin ku şirketa beşdar bi kêmanî %50 ji tevahiya mesrefên projeyê yên guncan dabîn bike.

Heye ku beşdariyên texmînkirî yên şirketê bi van rêyan bin:

- beşdariyên dravî;
- dema karmendan;
- peydakirina perwerdekar û pisporên teknîkî;
- alav û amûr;
- sazî û avahiyên perwerdeyê;
- cîhên hilberînê;
- materyalên tên xerckirin;
- alîkariya teknîkî ya ku ji aliyê şirketê ve tê peydakirin; û
- beşdariyên din ên nemadî yên guncan.

Pêvajoya nirxandina guncanîya beşdariyên nemadî dê li gor rêzikên derbasdar ên GIZê bin û di dema amadekirina projeyê de li ser wan bê lihevkirin.

Lîsteya dawî ya mesrefên guncan û rêzikên vegerandinê yên derbasdar, dê di dema amadekirina projeyê û imzakirina girêbestê de bêne piştrastkirin.

Hevkariya Geşepêdana Sektora Taybet – Nîşanşanderên ku Tên Pêşbînkirin

Tê pêşbînkirin ku şirketên serlêder armanca projeyê destnîşan bikin û plana wê saz bikin bi awayekî ku bêhtir armanca geşepêdanê pênase bike, ne berjewendiyên ticarî yên hevkarên sektora taybet.

Her weha, tê pêşbînkirin ku şirketên serlêder encam û nîşanşanderên rastîn ên tên pîvan destnîşan bikin.

Li gorî xwezaya projeyê, heye ku nîşanşanderên têkildar van xalan li xwe bigirin:

- hejmara derfetên kar ên nû yên hatine dabînkirin;
- hejmara kesên rahênan bûne û derbasî nav kar bûne;

- rêjeyên hiştina karmendên heyî;
- hejmar û rêjeya jinên karmend;
- hejmara ciwanên tevlî xebatê bûne;
- hejmara karmendên vegeriyane ser kar ;
- hejmara kesên astengdar yên tevlî kar bûne;
- hejmara karker û/an rahênerên ku beşdarî perwerdeyê dibin;
- hejmara kesên ku pêngavên perwerdeyê temam kirine;
- hejmara kesên ku pisporiyên destnîşankirî bi dest xistine;
- hejmara bername an yekîneyên perwerdeyê yên hatine geşepêdan an nûjenkirin;
- hejmara rahênankar, rênîşander an çavdêrên hatine perwerdekirin;
- pejirandina teknolojiyên nû;
- xurtkirina zincîreyên dabînkirinên herêmî yên hatine piştgirîkirin;
- berdewamiya bernameyên perwerdeyê piştî temamkirina projeyê;
- bandorên kar li gor demên dirêj;
- hevkariyên domdar ên di navbera şirketê û dibistaneke pêşeyî ya giştî an navendeke perwerdeyê de;
- pêkanbûna dubarekirinê li herêmê an jî li sektorên din.

Pêdivî ye ku şirketên serlêder, li ser bingeheke rasteqîn, armanc û awayên pîvana nîşanşanderên sereke, her ku pêkan be, peyda bikin.

Serlêdan dê bi taybetî li gor bandora wan li ser van xalan bên pêşkêşkirin: Geşepêdana pêşbînkirî, zêdekirina piştgiriya giştî, rewşa karsazî û domdariyê, lêkolînkirina pêwendiya geşepêdana şarezayî û afrênerîyê û veguhestina pisporî û zanînê, kalîteya şirketan, berhemdarî û pêbawerîya encamên tên pêşinyarkirin.

Beşa 4: Bang û Pêvajoya Serlêdanê

Pêvajoya hibijartinê ji bo hevparîyên geşepêdana sektora taybet di bin bernameya STEP de bi rêya **pêvajoyeke serlêdanê ya hevrikiyê ku ji du qonaxan e** tê birêvebirin, piştî wê hûrbîniya pêwîst, pejirandina dawî û sazkirina girêbestê tên.

Pêvajo hatiye sazkirin da ku ew projeyên ku armanceke wan a bazirganî ya zelal heye, geşepêdanê xurt bike, fînansekirina giştî ya hevpar zêde bike, sûdmendîya cîbicîkirinê û pêkanbûna gihiştina encamên domdar bidin xuyakirin, destnîşan bike.

Ajansa Almanî ya Hevkarîya Navdewletî GIZ dide nasîn ku ji mafê wê ye nexşeya demê ya rênîşander serast bike, zanyariîyên zêdetir bixwaze, hevpeyvînan pêk bîne an pêngavên nirxandin û piştrastbûnê zêde bike dema ku hewcedarî hebe.

Nerîneke Giştî li Pêvajoya Serlêdan û Hilbijartinê

Pêvajoya serlêdanê dê ji pêngavên jêrîn pêk bê:

Pêngavên Pêvajoyê	Nexşeya Demê ya Rênîşander
Weşandina Banga Serlêdanê û Nimêneyên Pêşkêşkirinê	30ê Çiriya Pêşîn a 2026an
Dîroka Dawî ya Pêşkêşkirina Bîrnameya Têgehan	23ê Kanûna Pêşîn a 2026an
Kontrolkirina guncaniyê û nirxandina bîrnameyên têgehan	Sibata 2027an
Agahdarkirina şirketên serlêder ên navên wan di lîsteya kurt de heye	Sibata 2027an
Sazkirina pêşniyara projeya tam û amadekariyên projeyê	Gulana 2027an
Nirxandina pêşniyara tam û pêkanîna hevpeyvînan ligel şirketên serlêder (eger pêkan be)	Gulan/Hezîrana 2027an
Hilbijartina dawî û pejirandin	Hezîran 2027an
Rrêkarên hûrbîniya pêwîst , kontrolên îdarî û qanûnî	Gulan/Hezîrana 2027an
Imzakirina girêbestê	Hezîran / Tîrmeha 2027an
Destpêkirina pêşbînkirî ya projeyê	Tîrmeh - Îlona 2027an

Nexşeya demê ya li jor rênîşander e û dibe ku ji aliyê GIZê ve li gorî hejmar û kalîteya serlêdanan, komplexbûna projeyên pêşniyarkirî, pêşveçûna pêvajoyên nirxandin û pejirandinê û hebûna budceyê bê serrastkirin.

Destpêkirina Bangê û Pêşkêşkirina Pêşniyaran

GIZ dê Banga Serlêdanê bi rêya kanalên ragihandinê yên hatine diyarkirin bide destpêkirin û dê nimûneyên serlêdanê û belgeyên rênmayan yên pêwendîdar berdest bike.

Pêdivî ye ku şirketên guhdanê bi vê yekê dikin, Bîrnameya Têgehan an yan jî Giringîpêdanê, bi rêya bikaranîna nimûneya fermî ya GIZê ta dîroka dawî ya di Bangê de hatîye diyarkirin pêşkêş bikin.

Pêdivî ye ku hemû serlêdan û belgeyên piştgiryê bi **Zimanê Îngilîzî** bên pêşkêşkirin. Belgeyên ku bi zimanekî din hatine nivîsîn, divê wergera wan a Îngilîzî ligel wan be. Pêdivî ye ku Bîrnameya Têgehan (Concept Note) zanyariyên têrker peyda bike da ku rê bide GIZê ku guncaniya şirketa serlêder û kalîteya destpêkê û peywendiya projeya pêşniyarkirî binirxîne.

Pêdivî ye ku Bîrnameya Têgehan bi kêmanî van xalan destnîşan bike:

- rewşa qanûnî ya serlêder, şêwazê xwedîtîyê û çalakiyên bazirganî;
- Şiyanên, rêveberî û darayî yên têkildar ên şirketa serlêder;
- hewcedariya sektora karsazîyê û/an pêdîvîya bazara kar a ku dixwaze çareser bike;
- projeya pêşniyarkirî û çalakiyên wê yên sereke;
- derfetên kar ên pêşbînkirî, geşepêdana şarezayîyê û encamên din ên geşepêdanê;
- rêbaza cîbicîkirinê ya pêşniyarkirî û hevparên cîbicîkirinê yên Sûrî, eger ji berê ve hatbin destnîşankirin;
- budceya projeyê ya texmînkirî û şêwaza fînansekirinê ya pêşniyarkirî;
- pişka hevkariyê ya tê payîn a serlêder;
- zêdebûna ku bi rêya piştgiriya GIZê tê dabînkirin;
- domdariya encaman a tê pêşbîkirin;
- pêkanbûna berfirehkirina projeyê, dubarekirin an avakirina hevkariyeke demdirêj.

Divê serlêdan bi awayekî elektronîk li gorî rênmayên di belgeyên Bangê de hatine berdestkirin bêne pêşkêşkirin.

Serlêdanên ku piştî dîroka dawî ya hatîye destnîşankirin bêne wergirtin, dê neyên berçavgirtin.

Kontrolkirina Guncaniyê

Piştî dîroka dawî ya pêşkêşkirinê, GIZ dê kontroleke destpêkî ji bo guncaniyê û temambûnê pêk bîne.

Kontrolkirin dê van xalan binirxîne:

- bicîanîna şirketa serlêder ji mercên guncaniyê yên herî kêm re, ên di Beşa 3yan de hatine destnîşankirin;
- bicihanîna projeya pêşniyarkirî ji mercên guncaniya projeyê yên herî kêm re;
- pêşkêşkirina hemû belgeyên pêdivî;
- hebûna projeya pêşniyarkirî di nav çarçoveya Bangê de;

- şêwaza fînansekirinê ya pêşniyarkirî li gorî mercên derbasdar e;
- serlêdan di dema hatiye diyarkirin de hatibe pêşkêşkirin.

Dibe ku GIZ daxwaza zelalkirinê an jî belgeyên zêdetir bike ji bo destnîşankirina guncanî û temambûna serlêdanê.

Tenê ew serlêdanên ku mercên guncaniya herî kêm ên derbasdar bi cih tînin dê bigihêjin qonaxa nirxandina teknîkî.

Nirxandina Pêşniyarên Projeyan

Dê bîrnameyên têgehan yên li gor mercan pejirandî ne, li ser bingeha pîvanên hilbijartinê yên di Bangê de hatine destnîşankirin bên nirxandin.

Nirxandin dê di nav mijarên din de, van xalan li ber çavan bigire:

- bandora geşepêdanê ya tê pêşbînkirin;
- nirxê ku li fînansekirina giştî ya hevpar hatiye zêdekirin;
- bikêrhatîbûna bazirganî û domdarî;
- asta guncavbûn û kalîteya geşepêdana pisporiyê û hêza kar;
- afirandin û pêkanbûna veguhastina teknolojya an zanînê;
- başbûn û asta guncawbûna hevbeşîya pêşniyarkirî;
- asta bikêrhatîbûna destwerdana pêşniyarkirî;
- pêkanbûna berfirehkirin û dubarekirinê;
- Kalîte û pêkanbûna pîvana encamên pêşniyarkirî.

Dibe ku GIZ mekanîzmayeke nirxandinê ya guncav deyne, di nav de komîteyeke nirxandinê ya navxweyî an derveyî an jî pisporên serbixwe hebin, li gorî mercên Bangê û rêkarên bernameyê yên derbasdar. Pêşniyar dê li ser bingeha pîverên nirxandinê yên objektîv ku berê hatine diyarkirin bên nirxandin. GIZ dê listeyeke kurt a şirketên serlêder ên ku pêşinyarên wan armancên Bangê cîbicî dikin, nîşan bide.

Pêşkêşkirina pêşniyarê tu mafî nade ku şirketên serlêder derbasî qonaxa din bibe an fînansekirinê bi dest bixe.

Amadekirina Lîsteya Kurt û Pêşxistina Pêşniyara Tam a Projeyê

Şirketên serlêder ên ku ketine lîsteya kurt de dê bên vexwendin da ku derbasî Qonaxa 2yemîn bibin , ku ya Pêşxistina Pêşniyara Tam a Projeyê ye.

Di vê qonaxê de, GIZ dê bi şirketên serlêder ku hatine hilbijartin re bixebite da ku projeya pêşniyarkirî zêdetir pêş bixe û baştir bike.

Dibe ku ev yek van xalên jêrîn li xwe bigire:

- ronîkirina armanca geşepêdanê û encamên pêşbînkirî;
- baştirkirina lojîka destwerdanê û çarçoveya encaman;
- pêşxistina nîşannderên pîvandar û destnîşankirina amûrên piştrastkirinê;
- nirxandineke zêdetir derbarê hewcedariya sektora karsazîyê û bazara kar;
- ronîkirina rol û berpirsiyariyên şirketa serlêder û hevparên cîbicîkirinê yên Sûrî;
- baştirkirina rêbaza cîbicîkirinê û plana kar;
- amadekirina budceya hûrbîn a berfireh û plana fînansekirinê;
- ronîkirina pişka şirketê ya hevkariyê;
- nirxandina domdarîyê û pêkanbûna berfirehkirinê;
- destnîşankirin û kêmkirina rîskên jîngehî, civakî û yên din ên cîbicîkirinê; û
- Amadekirina belgeyên ku ji bo nirxandin û rêkarên girêbestê yên paşê pêwîst in.

Ajansa Almanî ya Hevkarîya Navdewletî (GIZ), dê di nav vê qonaxê de rênîşandan û piştgiriya teknîkî peyda bike. Ev piştgirî nabe pabendî bi fînansekirina projeyê pêşinyarkirî. Serlêder dê wek berpirsyarê hûrbînîya pêşinyara dawî û temambûn û bikêrhatîbûna wê bimîne.

Pêşkêşkirin û Nirxandina Pêşniyarên Projeyên Tam

Ji şirketên serlêder ku dikevin lîsteya kurt de dê bê xwestin ku Pêşniyara Projeya Tam û belgeyên pê re heta dîroka dawî ya ku ji aliyê GIZê ve hatiye ragihandin, pêşkêş bikin.

Pêşniyara projeya tam, dê li gor pîvanên teknîkî û hilbijartinê yên pêwendîdar were nirxandin.

Dibe ku nirxandin van xalan li xwe bigire:

- nirxandina pêşiniyara teknîkî û çarçoveya encaman;
- nirxandina budceya hûrbînîya berfireh û şêwazê fînansekirinê;
- nirxandina pişka hevpariyê ya şirketê û zêdebûna ku tê ser piştgiriya giştî;
- nirxandina şiyana cîbicîkirinê;
- nirxandina hevkariya pêşniyarkirî û rêkarên hukumranîyê;
- nirxandina rîskan û pêngavên kêmkirina wan;
- nirxandina domdarîyê û pêkanbûna berfirehkirinê;
- piştrastbûna ji encaman û nîşanşanderên geşedanê yên hatine pêşniyarkirin.

Dibe ku GIZ şirketên serlêder ên ku bi awayeke destpêkî hatine hilbijartin, vexwendî hevpeyvîn an civîneke ronîkirinê bike, da ku projeya pêşniyarkirî, rêkarên cîbicîkirinê, budce, rîsk û encamên tên pêşbînkirin gotûbêj bikin.

Piştî nirxandinê, pêşniyara hilbijartina dawî dê li gorî rêkarên biryardanê yên derbasdar ên GIZê bê amadekirin.

Hilbijartina Dawî û Pejirandin

Hilbijartina dawî ya projeyan dê li ser bingeha van xalên jêrîn be:

- encamên baş ên nirxandina teknîkî;
- bicîhatina mercên guncantiya serlêder;
- başbûna nirxandina hûrbînîya pêwîst û duristîyê;
- encamên pejirandî yên kontrolên îdarî û qanûnî;
- pabendbûna bi mercên GIZ, û alîyên bexşîner û bernameyên derbasdar;
- piştrastkirina şêwaza fînansekirinê ya pêşniyarkirî;
- hebûna budceyê; û
- rêkarên pejirandina navxweyî yên pêdivî.

Ji mafê GIZê ye ku serlêdanekê hilnebijêre, tevî ku serlêdanê mercên guncaniyê yên herî kêm bi cih anîbin jî, eger pêşniyar pileya nirxandinê ya têrê dike bi dest nexe an jî eger mercên hilbijartin, pabendîyê an fînansekirinê yên din ên derbasdar bi cih neyên anîn.

Hûrbînîya Pêwîst û Kontrolên Îdarî, Qanûnî û Pabendîyê

Berî ku girêbesta hevkariyê bê encamdan, şirketa serlêder a hatîye hilbijartin dê têkeve bin kontrolên bazirganî, îdarî, qanûnî, pabendiyê û destpakiyê yên derbasdar de.

Heye ku pêvajoya Hûrbînîya Pêwîst ji van xalan piştrast bibe:

- tomarkirina qanûnî û xwedîtî;
- şêwazê rêveberî û hukumranîyê;
- şiyana darayî;
- belgeyên darayî yên kontrolkirî û dahat;
- pergalên pabendî û destpakîyê;
- rîskên sizakirin û dûrxistinê;
- dozên qanûnî an mijarên rêxistinî yên têkildar;
- rîskên jîngehî û civakî; û
- zanyarîyên din ên têkildarî hevkariya pêşniyarkirî.

Pêdivî ye ku şirketa serlêder hemû agahdarî û belgeyên piştgir ên ku bi awayekî aqlane ji aliyê GIZê ve ji bo van nirxandinan tên daxwazkirin peyda bike. Dibe ku GIZ pêvajoyê bide rawestandin eger kontrolên pêdivî bi awayekî têrker neyên temamkirin.

Imzekirina Girêbestê

Piştî temambûna nirxandina teknîkî, pejirandina dawî û hûrbînîya pêwîst bi awayekî serkeftî, GIZ û şirketa serlêder a hilbijartî dê derbasî pêvajoya girêbestê bibin.

Peymana hevkariyê dê van xalan diyar bike, li gorî ku pêwîst be:

- armancên projeyê û encamên geşepêdanê yên ku têne pêşbînkirin;
- çalakî û rêkarên cîbicîkirinê;
- rol û berpirsiyariyên aliyan;
- maweyê projeyê;
- budceya giştî ya projeyê;
- pişka GIZê;
- pişka şirketê;
- lêçûnên guncan û tedbîrên parvekirina lêçûnan;
- rêkarên diravdanê û raporên darayî;
- pêdivîyên şopandin, amadekirina raporan û piştrastbûnê;
- tedbîrên rêvebirina metirsîyan;
- hewcedarîyên têkildarî jîngehê, civakê, karmendan û mafên mirovan;
- rêkarên domdarî û vekişînê; û
- mercên guncan ên pabendbûn, kontrolkirin û bidawîkirina rêkaran.

Tenê piştî ku pêdawîstîyên girêbestê yên guncaw bi dawî bibin û peymana hevkariyê têkeve rewşa cîbicîkirinê, proje dikare dest pê bibe.

Ji şirketên ku projeyên GIZê bala wan kişandiye tê xwestin ku serlêdaneke bêkêmasî pêşkêş bikin.

Divê hemû belge bi rengekî elektronîk heta [23ê meha Kanûna Pêşîn a 2026, saet 23:59 bi dema Afrîqa Navîn (CET) ji vê navnîşanê re bêne şandin:

syria-private-sector@giz.de

ji kerema xwe re vê xêza mijarê ya jêrîn bikar bînin:

Banga ji bo Serlêdanê – Şirketek ku navenda wê li Sûriyê ye– [Navê Şirketê]

Serlêdanên ku piştî dema dawî bêne şandin dê neyên berçavgirtin.

Belgeyên Pêwîst

Divê şirketa serlêder van belgeyên jêrîn pêşkêş bikin:

1. **Belgeyên pabendî û durustiyê yên dagirtî** (bi bikaranîna nimûneyên fermî yên GIZê yên ku di belgeyên Bangê de hatine peydakirin).
2. **Bîrnameya Têgeha Projeyê ya dagirtî û îmzekirî** bi bikaranîna nimûneya fermî ya GIZ (pêwîst e).

Bikaranîna nimûneya fermî pêwîst e. Bîrnameyên têgehan yên formata azad dê neyên qebûlkirin. Ev formata rêxistinkirî ji bo hêsankirina nirxandina hevgirtî û zelal hatiye amadekirin.

3. Belgeyeke fermî derbarê ku şirketa serlêder bi awayekî qanûnî li sûrîyê tomarkirî ye.
4. **Kopiyek nû ya qeyda bazirganî ya fermî ya şirketa pêwendîdar** (an jî belgeyeke fermî ya cihê wê digire).
5. **Hesabên darayî yên salane yên du salên dawî yên ku hatine kontrolkirin(eger hebin)**, herî kêm yên salekê, an jî belgeyên berdêl ji wan re, ên ku bi awayekî serbixwe hatine kontrolkirin.
6. **Piştrastkirina hebûna bi kêmanî sê (3) karmendên tamdemî .**
7. **Kurteyek derbarê şirketê (dosya danasînê)**, ku çalakiyên sereke yên bazirganî, ezmûna pêwendîdar û şiyana rêxistinî di nav de bê berçavgirtin (ev dikare di nav nimûneya fermî ya Bîrnameya Têgeha Projeyê de bê bicihkirin, li cihê ku hatibe diyarkirin).
8. **Zanyarîyên li ser hevkar an hevkarên Sûrî yên ku hatine pêşniyarkirin**, eger berê hatibin diyarkirin (divê di nav nimûneya fermî ya Bîrnameya Têgeha Projeyê de bê bicihkirin).

Parastina Daneyan

Agahîyên kesane û yên taybet bi şirketê yên ku di pêvajoya serlêdan û hilbijartinê de têne şandin, dê ji bo van armancên jêrîn bêne bikaranîn

- nirxandina guncanîyê û serlêdanan;
- rêkarên hûrbînîya pêwîst û nirxandina durustiyê;
- amadekirina hevkariyên geşepêdanê yên texmînkirî;
- bestina peymanên hevkariyê û birêvebirina wan; û
- şopandin û nirxandina çalakiyên ku piştgirî wergirtine .

Serederîya bi zanyariyan re dê li gorî pêdivîyên parastina daneyan ên derbasdar û polîtîkayên GIZê be.

Agahdariyên zêdetir li ser bikaranîna daneyan dê di çarçoveya pêvajoya serlêdanê de bê peydakirin.

Têkilî

Ajansa Almanî ya Hevkarîya Navdewletî (GIZ) a sînordar

Deutsche Gesellschaft für Internationale Zusammenarbeit (GIZ) GmbH

Email : syria-private-sector@giz.de

Kurteya Mercên Sereke yên Guncanî û Fînansekirinê

Pêdivî (şert ûmerc)	**Pêşkêşkarên ku li Sûriyê bi cih dibin**
Cureyê Pêşkêşkar	Şirketa sektora taybet a armanca wê sûdewergirtin e
Cihê Projeyê	Parêzgehên Sûriyê: Şam, Gundewarê Şamê, Hims, Heleb, Der'a, Reqa, Laziqîye, Tertûs
Lîsteyên hesabên darayî yên kontrolkirî	Sala borî lê eger hebin, du salên dawî yên borî.
Karmendên tamdemî yên herî kêm	3
Fînansekirina hevbeş a giştî ya ji hêla GIZ ve tê peyda kirin	Heta %50 ji mesrefên rewa yên projeyê
Pişka herî kêm a GIZê	40,000 EUR
Pişka şirketê	Herî kêm %50 ji lêçûna giştî ya rewa ya projeyê

Pêdivî (şert ûmerc)	**Pêşkêşkarên ku li Sûriyê bi cih dibin**
Maweya projeyê	Di navbera 12-30 mehan de
Giringîpêdana Sereke	Dabînkirina derfetên kar, pêşvebirina şarezayîyê, geşepêdana karsaziyê, veguhastina teknolojî û zanînê
Qonaxên Hilbijartinê	Kontrola guncanîyê→ nirxandina teknîkî →pêşiniyara tam →hûrbînîya pêwîst →girêbestin